

# DEST KORTIRE JI ÇAV

(Edonîs , Mihemed Almaxût , Nîzar Qebanî , Unsî Elhac , Sûad Elsebah)

Werger: Ismaîl kose

## Pêşgotin

-Edonîs di sala 1930 de ji dayik bûye ,ji malbatek belengaz û feqîr ji gundê –qesabîne .  
piştî sêzde sala nih çû dibistanê ,lê li ser destê bavê xwe quran û hejmarek mezin ji helbestên  
kilasîkî ê erebî ezber kiribûn .

-di buhara 1944 an helbestek welat parêzî ji helbestên xwe li ber serokê komara sûrî ê wê demê  
xwend, û ew bû pêşneyazek gi derbasî dibistana firensî li tertûsê di be .

-di sala 1957 an koçkir libnanê wî û helbestvanê bi nav û deng yûsiv alxal kovara si,ir weşandin  
,û evê kovarê piroblemek pir mezin di rewşa a erebî dilîst ,û di 1969an wî bi tena xwe kovara  
(mewaqîf)weşand û ji sala 1981ê li ferensa

bi cî bûye ,di gelek kovara û rojnaman de nivîsandiye û hîn dinivîsîne .

-gelek xelat ê erebî û cîhanî sitendine.

-helbesta edonîs tucarî naweste , û nûjinî li cem wî ne tişteki arzane , nerînek nûye ji gerdûnê re .  
pirtûkên wî wergerîne gelek zimanê cîhanê hin pirtûkê wî evin.

1-helbestên yekem -1954

2-kaxetin di babîsokê de -1958

3-şano û neynik -1968

4-eve navê min -1980

5-ebcediya diwem -1994

\*\*\*\*\*

## Edonîs

1

carek din ji bê dengiya xwere bêj  
bela ji xwendina tiştan ûmirovan  
nesekine (ne raweste)

2

Fînîq firiya  
Bajar di bin baskên xwede bir  
Û hîn nehatite

3

Berî ronahiyê here  
Pêre yan bi dûvre

4

Ji tariya yekemîn  
Ronahiya yekemîn derket  
Di destpêkê de ronahî bû

5

Xwe nasbik  
Ah.....

Çilo kare bijî mirovekî  
Xwe nasdike

6

riwê wê bê denge

û ji bilî ziman di canê wê de  
nîne

7

av kaniyê xwe dixwe  
û çem ava wan vedixwe

8

Ji sîka xwere bêj sipas ji tere  
Ew a yekemîn biter hazir dibe  
Û windaye yekemîne

9

kevirê bingehîne di mala tede  
sorgoniye

10

Îro ê nizim dibe baye -babe  
Û toz ew a bilind dibe

11

şeva me çû , nema  
waye bi dû xwe de di herike

çemekî dirêje  
çemekî ji ronahiyêye

12

herdû destên wî paqijîn  
belkî ....  
lê , berî her tiştî ma te naskiriye  
gi du destên wî hene

13

nivîsadin ...  
mal zaroka zayîna guhertinêye

14

laşekî mêt...  
û romanek tirsonek  
ew di civakê de  
şanek ji şanê  
genîbûnê û herifandinê ne

15

li ser baskan dipeyive  
lê ji pêvî qeydan di peyvê wî de  
nînin

16

jiyana min du hevokin  
her yek dema xwe di rexna yêdin de  
derbas dike

17

xwe dide nasîn ku şaire  
lê lite dinere  
bi mîxên xwe

18

ez û welatê xwe  
di qeydekê dene  
ezê çilo jê çuda bibim  
û çilo ezê jê heznekim

19

şaşitîyên xwe di civînim  
ne ji bo wan têxim bin palgeha  
xwe de  
lê ji bo wan li riya xwe belabikim  
şaşitî jî vêketine  
20

ronahî  
ji nezanîbûna min matmayî ma  
gava min jê pirsî  
ewir çi di xwînin  
21

di zanim gava di xwînim  
di xwînim ji mirovekîre ew ezim  
lê ji kêre di nivîsim  
22

sed nanê gerim  
nanekî tenê ji garis çênakin  
23

şeva çû  
xwestibû bi azadiyê xewnekê  
bibîne  
ji ber wilo nikarîbû raza  
24

jiyanê ez tije birînkirim  
lê ji wan derneket ji pêvî  
baskan  
25

carekê ...  
min nerî  
hat dîtî ji mirinê  
ku ezman di kele û di fûre  
26

carekê ....  
di zarok tiya min de  
min zuxurên çemê gundê me  
kiribûn refikên biçûk  
û giriyê kaniyan  
di zingilê wê de di xwendin  
27

carekê ....  
mirovek li cem me dilovaniya xwe da  
hevalên wî gotin  
sitêrkek daket gora wî  
ew bi xwer bir mala xwe  
28

ku tu kêfxweş dibe  
bi tazîbûna sitêrkan  
di vê tu şevê li xweke  
29

her roj  
gula gulîstanê  
cîrana me a xweşik di xwaze

ji bo destpêka hilma wê be

30

ti av laşê rojevê naşo

wek ava xewna

31

do şiyarbûm ...belawela bûm

di xewna de bûm

di xewnê de min dît

bajarên pir lê malek tinebû

malên pir lê odayek tinebû

odên pir lê textek tinebû

textên pir lê razan ne dibû

32

dibêje tu ji min hizdike

çima tu ji şaşitiyên min

hiznake

33

ê ku zanibe helbestê bixwîne

ew bixwe dibe helbest

34

berbang laşê wê dixemilîne

û laşê wê xemla şevê dike

35

bawerî jêr tine

ji pêvî di lîstika hizkirinê de

36

gul ji hewdê xwe derket

ji bo dîtina wê

ji pêvî takî ewran li newqa wê

mane roj jî tazî bû

di payizê de

wilo hizkirin dizê

li gundê ez jê hatime

37

destê wê di destê min deye

û em herdû xerîbin

emê herdû sibê bimrin

di nav ciyekê de

38

tu tac li dora serê min neman

ji hizkirina wê pêve

hizkirina wê gulê çilmisîne

39

jiyanê em birin cem xwe

em avêtin xefka bahozên xwe

û sînga xwe da pencereyên

rojên me

40

ciyê ku me himbêzkir

ma gelo bêrya me dike

41

roniya ku ji te neyê

tariyek dine  
roka te  
di laşê min de  
şevêk dine  
42

jiyanê ji min pirsikir  
bi godê te min  
bersiv da  
43

gi babîsok ne bê cirba  
tu şoreş di ezman de çenedibûn  
44

eynê weke kaniyê be  
digrî li kulê xwe nabêje  
45

civakek ....  
her kes têde  
dirame û dinivîse û kardike  
wek ew bi tena xwe  
ronahiye  
ji ber wilo dinere  
ji pêvî tariyê nabîne  
46

dîroka gi xwîn wê dinivîse  
ne dîroke  
xwîneke dine  
47

hin civak nûjen hene  
tişteke tê de lipêş nakeve  
ji pêvî kevne peristiyê  
48

ronahiya xwe dide  
li her ciyê bela dike  
tev wilo kêr nabe  
pir dibe  
49

pirtûkin....  
dibe tu wan bi tiliyan tenê  
bixwîne  
50

mirin ewe  
ku tu bimîne wek xwe  
neyê guhertin  
51

ne jiyan a kine  
mirov ew ê kine  
52

şev li ser palgeha min  
raza  
lê di şiyar bûna min de  
53

bi çî zimanî – habîl

bi – qabîlre peyivî

54

çilo welat wê mezin be

bi mirovekî biçûk

55

her tişt

mere kare wan ji hev çêke

ji pêvî azadiyê

56

gava dixwazim derkevim

cem ronahiyê

di sîka xwe de dimeşim

57

xurt bûna min a mezin

di vê heryê deye

a ku sorgun nabe

û a ez jê çêbûme

58

ma birra bi qirka jêkirî

serê wekheviyê bilind dibe

59

civakek

her kes têde ban xwe

dike

60

dinivîsim

ne ji bo rastiyê bidim pêş

lê ji bo ez fêrî

lêgerîna wê bibim

61

hin kes wek gurane

yekî qebûl nakin

ji pêvî gava wî dixwin

62

dîrok gogek ji agire

di nav çiyê min de

digindire

63

ku av ne ji avê be

diba zûde ji tîbûnê bimra

64

ew di xwedeye

tev ku lê bi cînebûye

65

jêre pir nasname hene

ji ber ku bajarekî wî tenê heye

azadî....

66

xurtiya zarokatya te ew

dihêle tu karibe

raji kalîtya xwe

67

dem....

di civaka erebî de bê kare

68

gîha serê xwe dadixe

li ber bahozê

lê bawer nake tucarî

bi tiştê di bêje

69

tazîbûn ewe

ku ez te li xwekim

70

min laşê xwe nivîsand

ji riwê laşê tere

û laşê te dinivîsim ji riwê

nivîsandinêre

71

hizkirin

mijandinek her time

72

li ser rojhilat pevçûnê dikin

û pirsgirêka di pêşiya wan de

rojavaye

73

şaşitî pesnekî dine

ji azadiyêre

74

destê wî xwelî rêşdikir

û karê pirîskên vêketî

jê di herikin

75

dawî...

ma serê te kare vegere ciyê xwe

76

ramanê wî bi tofin

lê di serê wî tenê de

77

di nivîse ...

wek ê tirî digvêşe

ne wek ê meyê vedixwe

78

ji dema me rastî çêkiriye

em nema ji pêvî şaşitiyan

nasdikin

79

erê

tu kare serê tinebûnê

ji ser milê hebûnê

bide alî

helbestekê palgehekê têx nav berawê û vî milê

80

îro....

rojavayî çê dike

rojhilatî pê di peyive  
ê ereb dixwe û li çepika dixwe  
81

qedexe kirina pirtûkê  
wek qedexe kirina ...nane  
...birçîbûne  
82

rû ji mirinêre tune  
ji ber wilo her kes  
kare di riwê wêde bisekine  
83

jiyan te bi xelkêre di civîne  
lê min te bi ter dicivîne  
84

welatê zevî û kargehê ...deste  
wek ku çav welatê ...asoye  
85

sîngek vekirî  
lê ji sîngêre deng heyê  
wek zimanekî vekirî  
86

ji textê hizkirina wê  
cîhana ku jê heznakim derket  
87

ne destê wê  
ne gavên wê  
ê aso vedikin laşê wêye  
88

serê wê baran û bahoze  
lê laşê wê  
deryên ji tîbûnêne  
89

berê ez derbasî çemê hizkirinê  
dibim  
îro li ser ava wan dimeşim  
90

ma ez ji sîka xwere bêjim  
dest mede pirtûkê  
silavê li gulê nek  
pirtûk pirse û gul xwîne  
91

ji nama hiznakim  
vê westabûnê  
ji hizkirina xwer naxwazim  
ji gemiyek ji kaxetan  
de herin  
92

bi texmîna min  
ku pêl nasnameye meyêye  
93

eger tu çiqasî welat parêzbe  
çilo tu kare xwe bike

ji welatekî

94

baweriya min bi hişê wî nayê

ew dibêje ...

ez fêrî her tiştî bûme

95

lê ji bo çî ,bi çî alîde diçim

ji pêvî qurbanan nabînim

96

carekê....

min peyvek girt

ji devê ewran

97

ji bo çî kurê mûqefeh

li ser siyasetê

bi zimanê lawiran peyivîye

ma bira mirov wek ersto

daye xwiyakirin

lawirekî siyasiye (konevan)

an ji bo tiştekdin

98

hin ji me di nîvîsînî

ne ji bo li pêşiya zimanê xwe

bimeşîn

lê ji bo xwe li piş veşêrin

99

pir xurtim

wilo hizdikim

û bingeha xurtiya min ewe

ku ez ji pêvî qrlistiyê

tê de nabînim

100

nezan tiya wî çiqas

mezine

firehe ji bo xak û ezman

101

carekê ...

tîpek nema di ebcediyêde

henekê xwe bi min nekir

ji ber tim û tim

min pîrsa demê ji şûreşê di kir

ji kuştîyan pîrsa şûreşa wan di kir

û zirneyekê di nav lêvê min de

jêre û ji wanre

distira

102

xurt bûna min a mezin

di vê heryê deye

a ku sogun nabe

û a ez jê çêbûme

103

rastî zivre

û derew şayikin  
ji ber wilo em ereb  
pirê caran  
derewa ji rastiye çêtir di bînin  
104  
dem...

di civaka erebîde bê kare  
lê xuya di be tev wilo  
ew bi tena xwe a ku kardike  
105

berfa...  
ji ewrê hizkirinê di bare  
ew min di şewitîne  
106

ji min di xwaze  
ez dûrtir herim  
û ew dizane  
ez li serê herifandinê me  
ew kiye... û li kuye  
107

bi hêvîme  
ez yextina bi bînim  
di xewnê de  
ku perava bi dû xwe de dikişînin  
108

xwe nas nekir  
ji gava hizkir  
ku mirinê rahiştiyê  
di nav  
destê xwe de  
109

bi rastî  
carna raman ji lawira di tirsin

(dawî)

\*\*\*\*\*

## Mihemed Almaxût

-di sala 1934 an li bajarê selemiyê ji dayik bûye  
-ew ji helbestvanê pêşîye ê ku helbesta erebî a nûjen ava kirye  
-nivîsandinên maxût ne helbest tenê bû  
-şano û roman û sînyaro û quncik rojnama jî di nivîsandin  
-pirtûkên wî hatine wergerandin gelek zimana  
-berî demekê hindik ku here ser dilovanya xwe di sala 2006 an de xelata hêja a sultan iwês  
sitend

-ji pirtûkên wî  
1-şîneyek di ronahiya heyvê de -1959  
2-şahî ne karê mine -1970  
3- odayek bi milyonê dîwaran -1960  
4- kulîlkê nîsanê şano  
5- hêlan roman -1993

1

jina ew ji minre xewne  
ne dixwe..  
ne vedixwe  
ne radizê  
lê diricife  
xwe davêje himbêza min  
şîpya disekine  
wek şûrekî  
ku di dawiya  
hejandina xwe deye  
ax...  
kanî ew jinên erzan  
ji keçên mey îşk û fedyok  
yên goştê wan tarî û xweşikin  
wek textekî ji baranê  
wek textekî ji hêsir û baranê  
mane...  
qirşîk û avî û simaq  
ji serê pêşîrê wan di fûrin  
wek gava ji rehê xwîn di fûre  
jin li wire  
porê wê dirêj dibe  
weke gîha  
di bişkive ....di gincire  
di hile û zer dibe  
qurmên xwe  
bi ser herdû milande berdide  
pêşîr li wire nenase  
avjene li nav zeviya  
li ber te vedibe  
wek ewrakî  
wek ewrekî çûçîk wî  
di qetînin  
tu bi kud here  
di vî ezmanê fireh de  
dehl û kanî û baranî  
zevî û bayê hênîk û şerefe  
lê li vir  
ji jinêre hilma xwînê  
û bêhna serjêkirinê heye  
memik li wir bi çûkin  
wek gulê  
li vir mezinin  
wek serî  
bi tena xwe be  
li gundan  
keça xwey fedyok  
bibe piş kaniyê

bin darekê  
bi destê xwe çîm û riwê wê  
bişo  
ciyakî ji giya û morîk  
û bixçikên xwarinê  
wê ji ter rade  
û di nav destê te de  
wê bircife heta sibê  
bêyî ku çavê te têkeve  
çavê wê

2

min jêre got  
şamê ez tîme  
got hêsrê xwe vexwe  
min jêr got  
şamê ez birçîme  
got pêlava min bixwe

3

em qorzîkê mirîne  
di ara kirina  
jiyana nûde

4

li ser masakê rûniştin  
ji qedehekê vexwarin  
rojnamak bi hev re xwendin  
û guhdarî li sitranekê kirin  
û ahînek....  
ahînek dirêj kişandin

5

ji havînê naxwazim  
pêvî toza wê  
ji çile pêvî sira bayê wê  
ji payîzê pêvî tazî bûna wê  
û ji buharê pêvî jiyana wê

6

newal û cîhokên zûha  
bazdana hêdî di kin  
li bin ewran

7

ma ez welatekim  
hewcedarê sînorekîme  
an sînorekî hewcedarê  
welatekîme

8

çibkim...  
pêlav firehe di nigê min de  
û aso tengê li ser serê min

9

ji berê de kêfxweşî ne karê mine  
lê ana dijminatî karê mine

10

pînosa xwe wek şûr paqij

dikin

ji ber ku ez li ser şerefê  
dinivîsim

11

gog di destê min deye  
û wê bi mîne di destê min de  
ji bo ku ez nebim gog  
di destê ti kesî de

12

kokê min  
di pêlava min dene  
û cê lê disekinim  
û di bawîşkim  
ew welatê mine

13

simbil bi baranê  
hizkirin bi maçan  
azadî bi xwînê  
û helbest bi hêsrana  
tên avdan

14

ey hinavê vala  
lêvên tî  
çavên bi hêsir  
destê zirav  
ji berxwedana xwe  
dirêj bikin

15

ez hêdî hêdî çêdibim  
wek ne xweşiya pîs  
derman ji minre tineye

16

ey kuliyan birçî û lal  
wek mîletê min  
sinbilê min bêhêle  
bi kêrî te nayên  
sinbilê min  
ji kaxeta ne

17

ey evsanên ebedî  
ciyekî ji minre vekin  
ji bo ku di nav nigê wede  
razêm

18

helbestvaniya seîd eqil a matmayî  
min naskir  
û bi diranan ji ewran min sêvek  
dicût

19

gava diya min çekê xwe  
radixistin  
û min alî wê dikir

li ser xênî  
min roj naskir  
û ji şerwalê kalikê xwe  
ê raxistî li peravên çem  
min yexta fînîqî naskir  
20

heyv û rok û derya  
û sitêrk û ciya û daristan  
deynê min ê liwan .....dan  
lê bej  
hîn xwe dide viyalî wiyalî  
ji bo tiştêkî nede  
21

bûme di peyivim bêtir ku  
dînivîsim  
ey pênuşa qop  
tê bimîne  
di bin şiyarbûna min de  
22

şûna tiliyê min li ser kaxetan  
wek şûna gewdekî mirîye  
an jî darek rakirî  
li ser berfêye  
23

her nêçîrvanek xelasbe  
ji fetisandinê  
û kerî ji guran  
û gul ji zûhabûnê  
û şoreşvan ji mirinê an ji  
giftinê  
divê limêja min hazirbe  
ez firfirokek  
ji incîla me  
24

her tiştê dora min  
ji min reye  
û ji heqê mine  
baran , berf , siraba , tîr ,  
diran , nenûk  
heval an dijmin  
heta şiqama xurt li ser rûyê min  
ez wê vena gerînim  
25

tiştêk di vî welatî de  
ji mir tine  
ji pêvî qedeha vedixum  
û bayê dikşînim  
26

di her darekê de gulek  
venabe  
di her çilakî de ewrek nabare  
di her seyranekê de

hevalek kêfê naxwaze  
di her şevê qederê de  
belengazek li kolanê  
radizê  
ne ji xwere ne ji xeyrî xwere  
tiştêkî na xwaze

27

rojhilatek perçekirî  
di xwazim li ser taştê  
şoreşvanekî ne durist  
di xwazim li ser firavînê  
û jin qehpek tobedar  
di xwazim li ser şivê  
û payêzek veşartî  
tim bi dû min de be

28

her di bare  
newresêk li ser serê min difire  
û şaxek li ser pêlava min  
şin tê

29

gava ti xêzkên sor  
di çî warî de derbaske  
buhar dikeve bêrîka te

30

mamostayê dibistanê  
tişt ne dîtin  
di serê min de ji pêvî sipya  
di pozê min de ji pêvî liçkê  
di guhê min de ji pêvî qirêjê  
di bin nenûkê min de ji pêvî gemarê  
di cilê min de ji pêvî pîne û qulê nû  
cejnek bi dû cejnekê de  
û polîsan tişt ne dîtin  
di bêrîkê min de ji pêvî qaşilên  
bîhoka û navê dermanan  
û tişt ne dîtin li dora qirika min  
ji pêvî dîngeha dawî a ku ez  
jê revyam

31

xwedayê min  
destê min bigre  
bibe cîhokekê ez jê vexum  
bibe dîwarekî piştî xwe bidême  
bibe goristanekê li nav kevirê wê  
razê  
zindanekê asê ku hilma welat  
ji hesin û qamçiyê wê bêhin bikim  
bibe bangêkê  
ku bi nenûkê û helbestê û mereziya  
rojên xwe  
têde av jeniye bi kim

bibe neweşxanekê  
ji bo textorê welidandinê  
di qehfê min de lêxe  
wek zarokê nû çêdibe  
û lêxistinê pir bike  
ez di kenim ji bê baweriya xwe  
a zêde bi pêşerojê .

\*\*\*\*\*

## Nîzar Qebanî

1  
ji carekê pêve  
ji ter nabêjim  
ji te hezdikim  
ji ber birûsk xwe dûbare nake

2  
gava tu destê xwe  
ji ser pirtûkên min rake  
di bim helbestek  
ji kaxeta

3  
di kolanên şevê de  
cî nemane  
ku lê herim û bêm  
çavê te  
hemû firehiya şevê  
birye

4  
ji min namek hizkirinê  
ji te namek hizkirinê  
wê buhar çêbibe

5  
hilma gulê zimanê wêye  
ji ber wilo hewcedarê  
ferhengê nabe

6  
ji ber ku ez ji te hezdikim  
di xwazim  
tu tîpa bîst û neha be  
ji ebcedya min

7  
ku li cem gulê  
weşan xanek û weşan gerek heba  
dîwanek helbestî wê  
derxist

8  
daxwaza helbesvan  
ku bibe çûk  
lê çûk naxwaze  
helbesvan be  
ji bo rêjîma erebî

wî nake qefesê

....

\*\*\*\*\*

## Unsî Elhac

1  
ne di gerdûna mezin de  
lê di mejiyê xwe ê bicûk de  
windaye

2  
ji şayik bûna derewan  
dihilin

3  
bi guhdariyê  
em di bînin

4  
dest kûrtire....ji dev

5  
gotina te  
dûr bûna ji dengê wê tê

6  
hizkirin kwîraniye  
ji ber wilo di bîne  
tiştê ku ê bi cav nabînin

7  
ey gula sor  
a bi dilê sipî

wek mirinê  
8  
ronahî dernaxe  
lê vedişêre

.....

\*\*\*\*\*

## Sûad Elsebah

1  
şeva çû bû  
min xewnek dît .. ku ez bûm sinbil  
di çolên sînga te de  
tirsiyam xewnê ji ter bêjim  
ji bo tu min bebe cem nangehê  
bajar

û min neke nanekî gerim  
tu min buxwe

2  
şeva çû bû min xewnek dît  
ku ez bûm masiyek  
di ava zelal a çavê te de  
avjenî fikir  
tirsiyam xewnê ji ter bêjim  
ji bo tu mijanekê çavê xwe  
li min negre

û tu min bifetisîne

3

şeva çû bû min xewnek dît

ku ez helbestek bûm

di bêrîkek te de veşartîye

tirsiyam xewnê ji ter bêjim

ji bo ku tu min nede

weşanxanekî

û tu min qebhet neke

4

şeva çû bû min xewnek dît

ku ez ramidandî bûm

li bin darê evîna te

û tu şîrê çûka di de min

tirsiyam ji ter bêjim tiştê

min dît

ji bo tu nekene bi ramanên min

û tu sindoqa xewnên min neşkîne

.....

\*\*\*\*\*

**Hate belavkirin di malpera Newroz de di dîroka 24 Êlûn a 2009 an**

[www.yek-dem.com](http://www.yek-dem.com)

[info@yek-dem.com](mailto:info@yek-dem.com)